

Birêz Mistefa Hicrî:

“XWEPÊŞANDANÊN LI ÎRANÊ BERTEKEK 40 SALÎ YE”

»»»» R:3



Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Gştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (318) 20-01-2018 Buha (1000) Tûmen



“Frédéric Tissot”:

Dr. Qasimlo mamostayê min bû

»»»» R:6

Deftera Siyasî ya PDKÎ agehdariyek bo raya gştî belav kir



Kurdistanmedia: Derheq pejirandina terhê pêşniyarî yê sekreterê gştî yê PDKÎ ji aliyê Komîteya Navendî ya PDKÎ ve, pştî behseke têrûtejî û guhertinên pêwîst, Deftera Siyasî ya PDKÎ bo raya gştî, agehdariyek belav kir.

Deqa vê agehdariyê weha ye:

Agehdarî bo raya gştî

Hevwelatiyên Kurdistanê!
Têkoşerên Demokrat!

Roja Pêncşemiyê 28`ê Befranbara 1396 (18.01.2018)`an, civîna Komîteya Navendî ya PDKÎ hilbijartiya kongireya 15.mîn, bi beşdariya hemû endamên rêberiyê, di Kurdistanê de bi rê ve çû.

Destpêka civînê, rêzdar sekreterê gştî Mistefa Hicrî destûra karê pilînomê xiste ber bas, ku pêdeçûn û baskirin bû li ser terhê (piroje, gellale) pêşniyarî bo pêkanîna guhertinan di sîstema kar û pêkhateya PDKÎ de.

Di vê civînê de çend pêşniyarên heyeta diyarîkirî ya civîna pêştir ya Komîteya Navendî, ku li ser bingeha terhê (piroje, gellale) pêşniyarî yê rêzdar sekreterê gştî hatibû amadekirin, xistin ber bas.

Di civîna Komîteya Navendî de, pştî behseke têrûtejî li ser pêwîstiyên xebata îrorojê, û liberçavgirtina rastiyên xebatê û guhertinên di Kurdistan û navçeyê de, û baweriya bi pîvanên demokratîk û şoreşgerane, terhê (gellale, piroje) pêşniyarî ji bo

»»»» R:6

Kuştina girtiyan, yan xwekuştina girtiyan?!



Di rojên derbazbûyî de, Komara Îslamî li gora deb û resma xwe ya hertimî êrîşî ser komeke bendkiriyan kir, ku daxwazkarê bidestxistina mafên zewtkirî ên xwe ji aliyê rejîmê ve bûn. Saro Qaremanî, Husên Qadirî, Kiyanoş Zendî û Aram Me`azî, navê çar kes ji wan destbiserkiriyên Kurdistanê ye, ku pştî girtina wan ji aliyê hêzên dijîgelî ve, di reşçalên rejîmê de, û pştî îşkence û azareke hovane, canê xwe ji dest dan.

Herçend ku rejîm hewl dide wan cînayetên di nava girtîgehê de, wekî “xwekujî” bide nîşandan, lê derbazbûyiya pirr ji şerm ya rejîmê eşkere kiriye, ku Komara Îslamî hilgirê cinayetên qirêj û gemartir ji van cinayetan e jî.

Nûçeya kuştina wan azadîxwazan di demekê de belav dibe, ku roja Sêşemiyê 26`ê Befranbarê Mehmûd Sadiqî yek ji nûnerên rejîmê di meclisê de, bas ji vê kir, ku yek ji wan girtiyên ku di van dawiyane de jiyana xwe ji dest daye, pêştir di pêwendiyeke telefonî de bi malbata xwe ragehandiye, ku di girtîgehê de wan neçar dikin, ku hinek heban bixwin, ku pştî xwarina van heban, rewşa fîzîkî û derûniya wan ber bi xirabiyê ve diçe.

Her di vê derheqê de “Keyhanê Lenden” ji zarê Nesrîn Sitûde çalaka mafê mirovan ve belav kiriye, ku di girtîgehan de, bendkiriyan neçar dikin ku heba “mêtadon” bixwin, lewra bi dûr nizane ku sedema canjidestdana wan kesan mifahwergirtina ji wan heban be.

Cuda ji vê ku Komara Îslamî xortên azadîxwaz ên gelên Îranê bi vî awayî hovane dikuje, bi sedema hesta sadîsmê ya di nav derûna serkirdeyên wê rejîmê de, hewla azardana zêdetir ya malbatên wan dide.

Hêzên Îtila`atî ên rejîmê li bajarê Sine pştî kuştina Saro Qaremanî, bi zorî girteyên vîdyoyî ji Mihemed Qaremanî bavê Saro tomar dikin ku tê de dibêje: Kurê wî endamê yek ji hizbên Kurdî ên dijberî rejîmê bûye, û di şer û pevçûnan de hatiye

»»»» R:6

Sergotar

Rasan û Guhertin

N: Kerîm Perwîzî

Qonaxa Rasanê, yan jî pêkvegirêdana xebata çiya û bajar, serbarê reh û rîşeyên dîrokî ên wê, cureyek ezmûna nû ye, ku cardin pêwendiyên beşên curbicur ên civakê, civakeke xebatkar û mafxwaz dadirêje û erk û vezîfeyan cardin parve dike. Di vê qonaxê de, dîtingeh berfireh, û erk û vezîfe cardin têne pênasekirin, û civak bi hemû tex û çînên xwe ve, rol û erk û maf û hêviyên wan têne pênasekirin, û têne organîzekirin. Tiştekî gellek asayî û xwezayî tê berçav, ku di qonaxa nû ya xebatê de, û di guhertina siyasî ya li Îran û Kurdistanê û navçeyê de, û li bereberê guhertinên di Kurdistanê de, her girûp û alî û bi taybetî hizbên siyasî, ku xwe wekî erkdarê xebata neteweyî-demokratîk dizanin, hewce ye ku siyaset û erkên xwe û rêkxistinên xwe û herwisa şêwaza dariştin, û pêkhateya xwe û sîstema karkirina hemû organîzasiyonên xwe bixe ber jêhûrbînê, û xwendina îroyî ji bo wan bike, û di pêxema destnîşankirina kêmasiyan, û nirxandina xwe û hêza mirovî û civakî û siyasî de, dest bi lêkolîn û bîrkirin û cardin rêkxistina xwe bike, û di vê pêxemê de, erkên nû ji xwe re diyarî bike, û hekî hewce be jî, dest bixe nava serûbinê dariştina hêz û pêkhate û pitansiyêla xwe de.

Renge bo gellek kesan ew yek wekî tişteke navhizbî bê berçav, ku hizbek sîstema navxwe deskarî dike, ji bo wan girîng nebe ku ew hizba çawa hatiye dariştin, lê dema ku em li rola hizbê di organîzekirina civakê de dinêrin, û em dibînin ku her hizbek wê metoda ku kar pê dike, vediguhêze bo nav civakê de, û di rastî de, dixwaze ku xwe bike sembolek ji bo takekes û girûpên nava civakê de, û wê demê ye ku mijar dibe mijareke giştî û bandora wê li ser civakê dibe, û hekî ew hizb, hizbeke wekî PDKÎ be ku her cure liv û tevger yan berevajiyê wê, dengvedaneke girîng li ser jiyana siyasî û civaka Kurdistanê dibe, ew mijar hestiyartir dibe. Qanaxa Rasanê, qonaxek e ku pêwîst bi nûbûnê û cardin jêponijînê heye di hemû biyavan de, û kar û tekoşîn, û xewn û şêwaza pêngavhilgirtina ber bi hêviyan ve diyarî dike.

PDKÎ jî wekî her hizbeke din, di qonaxa nû de, pêwîstiya wê bi hizra nû, û hêza nû û xewnên cardin pênasekirî û sîstema karê nû heye.

Li gora van rastiyan e, ku zêdetir ji du sal e, bas û diyaloga cardin xwerêkxistin, û dîtingehdariştin di rêbertiya hizbê û serûbinê organên PDKÎ de hatiye kirin, û diyalogeke tevalî bi hemû lawazî û bihêziya xwe ve, di nava hizbê de hatiye kirin, û heta xistine ber çavên civakê jî, û piştî vê heyama zor, dîtinên hevbeş bi dengê giştî û bi lihevkirina di asta bilind ya rêbertiya hizbê de pêk hatiye, û bûye pejirandiyek bona pêşkêşkirina bi kongireyê, wekî organa herî bilind ya biryarder di PDKÎ de, da ku zêdetir ji berê digel gotara Rasan û pêkvegirêdana xebata çiya û bajar yek bigrin, û erk û vezîfeyên xwe yên dîrokî pêşve bibe.

RMMK: Dewleta Îranê dibe ku berpirsyariya parastina canê hevwelatiyan û girtiyan bigre stûyê xwe



Rêkxirawa Berevanî ji Mafê Mirovan a Kurdistanê daxwaza bersivdana derheq canjidestdana hevwelatiyên girtî , ji berpirsên dewletî emniyetî û dadwerî kir.

Rêkxirawa Berevanî ji Mafê Mirovan a Kurdistanê di daxuyaniyekê de ragehand ku îdi`aya berpirsyaran di vê derheqê de cihê gumanê ne, û dibe ku lêkolîn li ser vê pirsê bê kirin.

Di beşeke vê daxuyaniyê de hatiye: Her bi vê şêweyê ku medyayên navxweyî û derveyî rûmal kirine, hewlên emniyetî û polîsî ên Komara Îslamiya Îranê bona kontrolkirina nerazîbûnên xelkê, yan bi gotineke din serkutkirina meşên medenî li raserî Îranê de, heya niha bûye sedema canjidetsdana dehan hemwelatiyên medenî, û destbiserkirina hezaran hevwelatiyên din.

Eva di demekê de ye ku di heyama yek hefteya borî de, medya û ragehandin bas ji canjidetsdana çend hevwelatiyên girtî bi taybetî Sîna Qenberî, Wehîd Heyderî, Elî Polayî, Saro Qaremanî, Kiyanûş Zendî, û Aram Mo`azî di girtîgehên Tehran, Erak çalûs, Ehwaz û sine de dikin. Herçend ku berpirsyarên rejîmê ên dadwerî û emniyetî îdi`aya vê yekê dikin ku hejmarek ji girtiyên wekî Sîna Qenberî û Wehîd Heyderî xwe kuştine, û Saro Qaremanî di pêvajoya şer û pevçûnên çekdarî de hatiye kuştin, lê çavkaniyêîn serbixwe û navendên mafê mirovan vê îdi`aya berpirsan ret dikin.

Di beşeke vê daxuyaniyê de hatiye ku, Rêkxirawa Berevanî ji Mafê Mirovan a Kurdistanê li gora biryarnameya 173/43 a Civata Giştî ya NY a pejirandiya 09.12.1988`an derheq parastina mafê girtiyan, "Hikûmet û dewleta Îranê wekî berpirsê canjidestdana hemû binçavkirî û girtiyan dizane". Rêkxirawa Berevanî ji Mafê Mirovan a Kurdistanê daxwazkarê bersivdayîna rastbêjane ya berpirsyaran di vê derheqê de û lêkolînên serbixwe ye, bona eşkerebûna rastiyan, û bi taybetî derheq eşkerebûna canjidestdana çend hevwelatiyan li girtîgehan, di van rojên borî de.



www.arsivakurd.org

Hevpeyvîna Spûtnîk Kurdistanê digel Mistefa Hicrî sekreterş giştî ê PDKÎ derheq meşên nerazîbûnê di Îranê de

Sekreterê giştî yê PDKÎ Mistefa Hicrî anî ziman ku serhildan û xwepêşandanên xelkê Îranê, encama bêzarî û nerazîbûna li hember siyaset û baweriyên jiparemayî yên rejîma Îranê ye û ev yek 40 sal berê dest pê kiriye. Hicrî destnîşan kir ku di çerçoveya demokrasiye de piştgiriya xwepêşandanan kirine û Îran ti wext ji bo diyalogê bi wan re rast tevnegeriya ye.

A: Ekrem Altun

Di 7`ê Berfenbarê (28.12.2018) de, li bajarê Meşhedê bi hezaran kes derketin kolanan û polîtîkaya aborî û tundiyê ya rejîma Îranê şermezar kirin. Di demeke kurt de li gelek bajaran çalakiyên şermezarkirinê belav bûn, di navbera gel û hêzên rejîmê de şerên dijwar rû dan. Di çalakiyan de nêzî 30 kesan hatin kuştin û bi 100`an kes jî birîndar bûn. Sekreterê Giştî ê Partiya Demokrata Kurdistana Îranê (PDK-Î) Mistefa Hicrî li ser xwepêşandanên li Îranê û pêvajoya aştiyê bi Îranê re, ji Spûtnîk Kurdistanê re nirxand.

‘XWEPÊŞANDANÊN LI ÎRANÊ BERTEKEK 40 SALÎ YE’

Sekreterê giştî yê PDK-I Mistefa Hicrî anî ziman ku: Serhildan û xwepêşandanên xelkê Îranê, encama bêzarî û nerazîbûna li hember siyaset û baweriyên paremayî yên rejîma Komara Îslamî ya Îranê ne. Ev nerazîbûn, ji destpêka bidestvegirtina desthilatê ji aliyê rejîma îslamî ve, anku ji 40 sal berî niha ve dest pê kirine û li ser hev kom bûne.

Di vê demê de rewşa aborî ya xelkê Îranê roj bi roj xirabtir bûye. Bêkarî li nav xwendekarên zanîngehan de sedî 40 derbas bûye. Heqdestê kedkaran gelek hindik e, gelek caran 6-7 mehan jî dûre tê dayîn. Giranî hawarê dike û nirxa hewcehiyên rojane ên milet roj li dû rojê jorde diçe, bi awayekê ku gelek malbat di Îranê de bona bijîva rojane ya jiyana xwe di tengasiyê de dimînin. Piraniya dahatên Îranê di bin navê hinartina şoreşê de ji bo pawanxwaziyên rejîmê li derweyî welat ,û ji bo şer, fitne û dubendî afirandinê tê mezaxtin. Em mînakên vê li Yemen, Sûriye, Îraq, Lubnanê dibînin. Dahat û samana mayî jî, diçe berîka desthilatdarên diz û gendel ên rejîmê û tê talankirin.
Hicrî bal kişand ser vê ku, ku sedemên bertekên milet tenê ne aborî ye.
“Pirsgirêkên li Îranê tenê ne yek in. Ya girîngtir, rewşa aloz û xirab ya xelkê Îranê, di aliyê civakî û ewlehî de ye. Lewra ji ber siyaseta seqet û şaş ya rejîmê, miletê Îranê di rewşa herî xirab ya piskolojîk de dijîn. Wek mînak li gor agahiyên rejîmê bixwe:



— Di warê xweşewitandina jinan de, li Rojhilata Navîn, Îran dereceya yekemîn de ye.
— Ji sedî 24 xelkê Îranê rastî giriftên piskolojîkî hatine.
— Şeş milyon û çarsed hezar (6,400,000) kes tûşî xemokiyê bûne.
— Ji sedî 40 ciwanên ku xwendina zanîngehê qedandine, niha bêkar in.
Serbarê van pirsgirêkên ku rejîmê ji xelkê re pêk aniye, azadî û bernameyên şadîhîner jî tunene. Neteweyên xeyrî Fars û oldarên xeyrê Şî`eyan tên cudakirin û perçiqandin. Rejîma Îranê li van çardeh salên dawî de hertim xelk xapandiye, û di encamê de xelk jî ji rejîmê bêbawer bûne û rizgarbûna xwe, tenê di xerabkirin û hilweşandina vê rejîmê de dibînin û bo vê armancê jî dixebitin û serî hildidin.”

‘KURD JÎ TEV Lİ XWEPÊŞANDANAN BÛN’

Mistefa Hicrî di derbarê tevlêbûna Kurdan de jî ew agahî dan:
Heya niha jî li hin bajar û deveran de xelk di qadan de ye û serhildana van berdewam e, lê weke hefteya yekem berfireh nîne. Kurd jî li Kirmaşan, Îlam, Sine û çend bajarên din de beşdarî xwepêşandanan bûn. Sedemên beşdarî û serhildana wan jî weke hemû bajarên din yên Îranê, rewşa xirab ya aborî bû ku ji ya xelkê deverên din ên Îranê çend qat xirabtir û şipirzetir e. Sedema din jî, siyasî ye ku mafên neteweyî ên wan ji aliyê rejîma dîktator ya Îranê ve hatine binpêkirin.

Hicrî di derbarê rêbaza PDK-İ ya alîkariya xwepêşandanan de jî agahiyên balkêş Sputnik Kurdistanê re parvekir. Partiya me siyaseta piştevanîkirin ji bo daxwazên demokratîk ên xelkê girte ber xwe û daxwazkarê wê bû ku xelk, xwe ji tundûtûjî û aloziyan biparêzin da ku hincet bona tepeserkirina wan nekeve dest rejîmê.

‘KOMARA ÎSLAMÎ JI BILÎ ÎDEOLOJIYA XWE TU MAFÊ NAS NAKE’

Komara Îslamî ji bilî îdeolojiya xwe tu baweriyek bi mafên netewî, pirsa kurd û neteweyên din ên Îranê nîne, lewre li dijî her terzê daxwazên netewî disekine û daxwazên bi vî rengî jî bi tawana “parvekirina Îranê” û “pîlanên dijminên Komara Îslamî” serkut û ji bo tometbarên van dosyeyan jî, cezayên demdirêj yên girtin yan jî darvekirinê dide.
Mistefa Hicrî bersiva pirsa me ya “dewleta Îranê heya îro qet xwest bi we re bikeve diyalogê” wiha da:
Her dema ku rejîmê xwestibe diyalogê bi Kurdan re bike, xwedî niyetek paqij nebûye, belkî bi armanca birêvebirina kumpiloyek qirêj li dijî kurdan kiriye.

Wek mînak cînayeta şehîdkirina sekreterê giştî yê berê Dr. Qasimlo û hevalê wî Ebdulla Qadirîazer. Van nûnerên me di sala 1989`an de li Viyanayê li ser maseya diyalogê ya bi Îranê re şehîd kirin.

‘KURD DAXWAZA ÎDAREKIRINA WELATÊ XWE DIKIN’

Sekreterê giştî yê Partiya Demokratê Kurdistana Îranê Mistefa Hicrî di dawiya axaftina xwe de behsa siyaseta giştî ya partiya xwe kir.

“Siyaseta giştî û fermî ya partiya me, piştevanîkirin ji mafê diyarkirina çarenivîsa kurdan li hemû parçeyên Kurdistanê ye. Merama min ew e ku, Hizba Demokrat rêz ji îradeya giştî ya gelê kurd bigre, li diyarîkirina şêwaz û metoda îdarekirin û birêvebirina welatê xwe de; vêca ew metod, otonomî, federalî yan serxwebûn be.”

www.ars

Komara Kurdistanê, Netewe û welatperwerî





Elî Munezimî

Nasiyonalîzma Îranî ku xîmê wê li ser şovînîzma netewe-eya serdest hatiye danîn, xurtkirina nasiyonalîzma xwe, li dujminatiya netweyên bindestê Îranê de dibîne

Bizava neteweperweriya Kurd di Rojhelata Kurdistanê de piştî bidavîhatina şerê duyem yê cîhanî, bo damezirandina dewlet-neteweyekê têkoşînek bêhempa kir, û serkomarê Kurdsitanê – Pêşewa Qazî- xebata partiya xwe bi domandina xebata bizavên Kurdan yên pêş xwe de da zanîn, û ew yeka jî tê vê wateyê ku Kurdistan yek welat e, û armanca bilind ya Komara Kurdistanê damezirandina dewlet-neteweyekê bûye bo Kurdistaniyan, ku têde mafên hemû Kurdistaniyan bê ferq û cudayî were parastin. Ew bizava wê serdemê, li ser du stûnên neteweperwerî û welatperweriyê hatibû damezirandin û vê yekê jî bi nobeta xwe, rûmetek mirovanetir û giraniyek xasmanî dida wê Komarê. Komara Ku xwediyê tecrubeyek yekane û cihê dersjêwergirtin û jêfêrbûnê ye bo hemû gelên Rojhelata Navîn, û bi taybetî gelê kurd.

Komara Kurdistanê bi xebat û têkoşîna gelê me û rêberiya Hizba Demokrat a Kurdistanê, li ser bingeha nirxên hevpar û daxwazî û îradeya xelkê xwe hate avakirin, û di xeyal û hizrên xwe de dixwast tixûbên civakî û qada siyasî ya hevbeş bo Kurdan û Kurdistaniyan bide destnîşankirin, û bi riya mêtaforên avakarî (architecture) kurdistaniyan weke dewlet-neteweyeke azad û serbixwe dora hev bicivîne, û di nava tixûbên dewletek nû-avakirî de, wan bike xwediyê azadî, wekhevî û biratiyek rastîn.

Nasiyonalîzm û nîştimanperwerî di Komara Kurdsitanê de ku piştre jî wek mîrat bo Kurdan bi cî maye, û îro rojê jî aliyê rêvîngê riya Pêşewa Qazî ê şehîd ve cehd bo tê kirin, xwediyê rûyek mirovane ye, û berî vê ku li ser kurdbûnê pêdagir be, li ser Kurdistanîbûnê pêdagir e, û hemû merivên ku di Kurdistanê de ji dayîk dibin, xwediyê maf û azadiya wekhev in. Ew yeka ku kakila bîr û baweriya Kurdan bo azadî û serbestiyê pêk tîne, û xala cudaker ya nîştimanperweriya Kurdan û neteweyên dagîrkerê Kurdistanê ye, armanca wê gotarê jî zelalkirina wê hindê ye. Lê li ber ku ew mijara zor girîng e û îmkan nine li gotarek wuha kurt de li ser hemû xalan tekez bê kirin, tenê emê vê yekê tevî nasiyonalîzm û nîştimanperweriya Îraniyan bidin ber hev.

Nîştimanperwerî (Patriotism) anku kesek hez ji welatê bav û kalên xwe bike. Welatperwerî xwediyê pîvanên erênî û aştîxwazane ye, û kesek nîştimanperwer hez ji pêşveçûna welatê xwe dike, û cehd dike ku kêmasiyên welêt çareser bike.

Lê nasiyonalîzm dikare hem aliyên erênî hebin û hem jî yên nerênî. Nasiyonalîzmek nerênî dikare geşe bike û bibe şovînîzm yan nazîsm. Zana û pisporên zanistên civakî bo şirovekirina nasiyonalîzmê, netewesaziya Fransî û Almanî wek du cureyên nasiyonalîzmê didne nasandin, ku tê de nasiyonalîzma Fransî, nasyionalîzmek siyasî (Demos) ye ku bingeha wê li ser îradeya xelkê welêt hatiye danîn, û xwediyê nirxên wekî azadî, wekhevî û bratiya xelkê welêt e, ku tê de xelk sexmeratî hebûna cudahiyên êtnîkî û kultûrî di nava tixûbên welat de bi hev re dijîn. Lê nasiyonalîzma Almanî ku bi nasiyonalîzma kulturî (etnos) tê naskirin, li ser bingeha komkirina xelkekê bi kultur, ziman, paşbingeh, xwîn, nasname, nirx û edetên wekhev e di welatekî de.

Şoreşên Kurdan li pêxema pêşxistina welatê wan de, bo azadî û jiyanek birûmet hatine û têne meşandin, û ew kesên ku di riya vê yekê de dixebitin, xwediyê hestên bilind yên hezkirina welat in, û ji hemû hemwelatiyên Kurdistanî re maf û azadiya wekhev dixwazin, û di piratîk de jî bi rê ve dibin. Vê yekê di serdema Komara Kurdistanê de jî xwe nîşan dabû û her li ber vê yekê jî hemû xelkên ne-Kurd jî hez ji Komara Kurdistanê dikirin. Bo nimûne Cihûyên Mehabadê xwediyê azadiya xwe bûne û çendîn mezinên Azeriyan ên derdora Urmiyê daxwaz kirine ku herêmên wan bikevne bin desthilatdariya Komara Kurdistanê de. Her wisa, piştî têkçûna Komarê û dirêjîdana wê xebatê ji aliyê PDKÎ ve, bi dehan û sedan malbat û kesên ne-Kurd (Azerî û Fars û …hwd) tevlî xebata hizbê bûne, û li pêxema azadiya Kurdistanê de xebitîne, û hindek ji wan canê xwe jî di vê riyê de danîne.

Lê mixabin nasiyonalîzma Îranî ku xîmê wê li ser şovînîzma netewe-eya serdest hatiye danîn, xurtkirina nasiyonalîzma xwe, li dujminatiya netweyên bindestê Îranê de dibîne û dixwaze bi zordarî wan di nava nasiyonalîzma çirûk û sexte ya Îranî de bihelîne. Bo vê armancê, nasiyonalîzmek ava kirine ku bo afirandina nakokiyan e di navbera xelkê de, û xelkên xêncî xwe tinazê xwe pê dikin, û maf û azadiya wan jê zewt dikin û nahêlin ku bi azadî kultur û nirxên xwe pêş bêxin, û pêşkevtina wan nirx û kulturan bi metirsî li ser nasiyonalîzma xwe dizanin.

Wek erkek nîştimanî em dibe têkoşîna xwe bo nasandina baştir û zêdetir ya nirxên welatperwerî û nîştimanperwerî ku li Komara Kurdistanê ve bo me bi mîrat mane zêdetir bikin, û ew yeka jî, wê yekîtiya di navbera hemû Kurdistaniyan de zêdetir û riya gihîştin bi armancên Komarê jî ronahîtir bike.

Jêder:

http://www.bevegelsen.no/forumet/view.php3?site=bevegelsen&bn=bevegelsen_aentforum&key=1196631406

https://www.aftenposten.no/meninger/kommentar/i/wELl1/Det-er-lov-a-elske-sitt-land

http://www.lystad.org/stuff/div_ungd_vgs/Nasjonalisme_og_imperialisme.pdf

www.arsivakurd.org

Komara Kurdistanê nahê jibîrkirin



Hemze Reşîdiyan

Komara Kurdistanê ku ji aliyê endam û alîgirên PDKÎ ve bi 2`ê Rêbendan tê binavkirin, li 22`ê Çileya Paşîn a 1946`an de, li Rojhelata Kurdistanê hate damezrandin. Komara Kurdistanê ji aliyê pêşewayê gelê Kurd di Rojhilata Kurdistanê Qazî Mihemed ve, li barjarê Mihabadê, di meydana Çarçirayê de hate ragehandin. Pêşengê damezirandina wê komarê PDKÎ bû.

Di dîroka gelê kurd de cara yekê bû ku komareke bi sîstema mudern a rêberîkirinê û dewletdariyê hatibû damezrandin. Di sîstema dewletdarî û rêveberiya vê komara seva de, serok û kabîna wezîran hatibûne avakirin, û ji çendîn beşên curbicur wekî pêşmerge, aborî, navxwe, perwerde, pêwendî û hwd... hatibû pêkanîn, û berpirsyar jî wekî wezîr bo her beşekê hatibûne diyarîkirin, ku karûbarên rojane yên wê beşê bi rê ve dibirin. Kabîna Komara Kurdistanê ji serkomar, serokwezîr û 12 wezîran pêk hatibû, û Qazî Mihemed wekî serkomar hatibû dîyarîkirin.

Sistema komara Kurdistanê ku 71 salan pêş niha de hatiye avakirin, modern û pêşkevtî bû, û niha jî li gellek welat û dewletên cîhanê bi taybet li welatên ku tê de sîstema komarî hene, ew sîstema birêveberiye hene, û di hin welatan de tenê hinek beş, pêve hatine zêdekirin.

Her çend ku temenê Komara Kurdistanê zor kêm bû, lê di zor aliyan de serkevtî bû. Ji aliyê aborî ve komara Kurdistanê bi hemî kêmasiyên xwe ve, ser pêyan sekinîbû, û zortir bi gelê Kurd ve hatibî girêdan. Sîstema “ewariz û malîyat” li nav gund û bajarên Rojhelatê Kurdistanê de hatibû danîn, û bac ji bazerganan dihate wergirtin. Li aliyê perwerde û xwandinê de li gund û bajarên Rojhelatê Kurdistanê de qutabxane hatin avakirin, û bo cara yekê bû ku li qutabxanan de perwerde bi zimanê Kurdî dihate kirin. Zimanê kurdî bibû zimanê fermî yê îdare û qutabxanan li Rojhelatê Kurdistanê, û rojname û kovar bi zimanê Kurdî dihatin weşandin.

Komara Kurdistanê li wextekê de hate ragehandin ku sîstema feodalî li Kurdistanê de li ser civaka kurdistanê de zal bû, û civaka kurdan di gellek aliyan de paşkevtî bû, û nexwendewarî hokarê serekî yê paşkevtina civaka kurdî bû. Malbat û eşîretan roleke mezin li nava civaka kurdan de digêran. Jinan li malbat û civakê de roleke wisa ji bilî xêzandariyê tunebûn. Deshelateke bi tewahî mêrserdest di kurdistanê de bi ser xelkê de zal bû. Di wê demê de Komara Kurdistanê pêngavên baş bo perwerdekirina civakê avêtibû. Hindek sazî û komel bo perwerdekirina civaka Kurd ji aliyê komarê ve hatin damezirandin, ku wekî mînak saziya Lawan û saziya Jinan bûn.

Gelê Kurd her sal 2`ê Rêbandanê bi coşeke mezin pîroz dikin, û nîşan didin ku ji dîroka xwe xwedî derdikevin. 2`ê Rêbendanê bi şêwazên curbicur li aliyê gelê Kurd û part û saziyên Kurdistanê ve tê pîrozkirin. Li hindek ciyan bi şêwaza semînar û baskirin li ser komarê, li hindek ciyan wekî cejn û şahî tê pîrozkirin. Di navxweyî welat de Komara Îslamî rêyên pîrozkirina 2`ê Rêbendan li gelê kurd girtiye, û nahêle ku ew roj bi awayekê azad bihête pîrozkirin, lê dîsan jî gelê kurd û endam û layengirên PDKÎ bi silogannivîsîna li ser

Komara Kurdistanê li wextekê de hate ragehandin ku sîstema feodalî li Kurdistanê de li ser civaka kurdistanê de zal bû, û civaka kurdan di gellek aliyan de paşkevtî bû

der û dîwaran wê rojê pîroz dikin.

Roja ragehandina Komara Kurdistanê bûye rojek netewî li Rojhelatê Kurdistanê, û bi taybet rola Qazî Mihemed wekî serokê wê komarê, bûye sembola azadî û berxwedanê li nava gelê kurd di her çar parçên Kurdistanê de. Berxwedana Qazî Mihemed li zindanê de, bûye rênîşander û bawerbixwebûna li nav endamên partî û saziyên kurdî de. Hemî part û saziyên kurdî li kurdistanê bi şêwazên taybet rêzê ji rola Qazî Mihemed digirin.

Qazî Mihemed bûye sembola berxwedanê li zindana rejîma Şahê dîktator de, û berxwedana wî tenê berevanîkirin ji mafê gelê kurd bû, û bi dijminê gelê Kurd radigehand ku bi bidarvekirina wî, nikarin azadiyê ji gelê Kurd bistînin, û gelê Kurd bi awayekî sîstematîk asîmîle bikin. Niha jî em dibînin ku hizr û wesiyeta Qazî Mihemed bi cîh hatiye, û şoreş û xebat li her çar parçên Kurdistanê didome, û keç û xortên şoreşgêr bo azadiya Kurdistanê canê xwe fîda dikin, û silogana ”YAN KURDISTAN YAN NEMAN” digel alaya rengîn li ser çiyayên Kurdistanê bilind kirine, û berxwedaneke nûjen wekî RASAN li Rojhelatê Kurdistanê dest pê kirine.

2`ê Rêbendanê li hemî gelê Kurdistanê û bi taybet endam û alîgirên PDKÎ ku ala hilgirê 2`ê Rêbendanê ye pîroz be, û xebat û berxwedan heta azadiya Kurdistanê berdewam e.

www.arsivakurd.org

“Frédéric Tissot”: Dr. Qasimlo mamostayê min bû

“Frédéric Tissot” yek ji dostên herî nêzîk ên Dr. Qasimlo û PDKÎ di bernameya “Pencemor” a Rudawê de, bas ji vê kir, ku Dr. Qasimlo mamostayê wî bû, û ew ji riya Dr. Qasimlo ve şarezayî çand, kultur, û dîroka Kurdan bûye. Wî got ku Dr. Qasimlo kesekî gellek rêzdar bû, çend ziman dizanîn û bi Fransiyeke gellek baş qise dikir.

“Frédéric Tissot” derheq yekem dîtina xwe û Kendal Nezan serokê Enstîtuya Kurd li parîsê got: “Min di sala 1980`î de yekem car Kendal Nezan dît, û wî daxwaz ji Rêkxirawa me kir ku em wekî pizîşk serdana Îranê bikin, jiber ku Kurdan kêşeya nebûna pizîşkan hebû, û eva bû ku me sê pizîşkan serdana Kurdistana Îranê kir.

Pêşmergeyan em ji sînor derbazî Kurdistana Îranê kirin, û derbazbûn wê demê gellek bizehmet bû. Yekem kes fermande Nebî Qadirî fermandê pêşmergeyên PDKÎ bû, ku ez pêre nasiyar bûm, û ew kes kesekî gellek jêhatî bû”.

Wî derheq yekemîn hevdîtina bi Dr. Qasimlo re got: “Ez şeş mehan di nava pêşmergeyên PDKÎ de mam, û min xizmeta wan di warê pizîşkî de kir. Wê demê şevekî em nêzî şikevtekê bûn ku çend endamên Deftera Siyasî li wir bûn, dema ku di şeveke tarî de, em çûne nava vê şikeftê de, kesekî bi zimanê Fransî bixêrhatina me kir, û got: “bixêr bên pizîşkno”. Ez veciniqîm, û tûşî şokê bûm, ku gelo eva kî ye ku weha Fransî dizane, belê ew Dr. Qasimlo bû”. Di roja 9`ê Xezelwera sala borî de, dema ku heyetek ji Komîsyona Ragehandinê ya PDKÎ di rêûresma perdevêdedana li ser pirtûka nû ya “Frédéric Tissot” li jêr navê “Mirovek li ser piyan” beşdar bibû, navbirî di vê merasimê de ragehandibû: “Ez hêvîdar im ku bikarin hertim di nava van hevalên xwe de bim, û xizmeta Kurdan bikim.



Ez vê pirtûkê pêşkêşî Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî dikim, ku mezintirîn dost û mamostayên min bûn.

“Frédéric Tissot” pêştir di civînekê de bi çavên pirr ji rondik gotibû: “Herçend mala min heya goristana Pirlaşêz 300m e, lê min şîret kiriye ku piştî mirina min, min li cem hevriyên min ên mêjîn Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî bi axê bispêrin, da ku heta-heta ez digel wan bim”.

“Frédéric Tissot” di tîma Pizişkên Bêsînor de, di dema bûyerên tall û terajidî ên dehika 80 û 90`î a Zyînî de, gellek alîkariyên mezin û jibîrnekirî bi Kurdên Başûra kurdistanê kirin, û wekî pizîşk di nava binkeyên PDKÎ de, xizmetên binirx bi pêşmergeyên vê hizbê kirin.

“Frédéric Tissot” derheq referandoma Kurdistana Başûr berî birêveçûna referandomê, di “twitt”ekê de nivîsandibû: “Dostên min ên Kurd! tu carî vê xencera ku “Henry Kissinger” di sala 1975`an de, piştve li we xist, ji bîr nekin.

“Frédéric Tissot” hertim gotiye ku, ew xwe wekî yek ji pêşmergeyên PDKÎ dizane, û şanaziyê pê dike.

A: Şehab Xalidî

www.arsiv.yekurd.org

»»»» Doma agadariya PDKÎ

guherîna pêkhate û sîstema karê PDKÎ, guherînkariyên hewce tê de hatin kirin, û ji aliyê hemû beşdaran ve hate pejirandin.
Vê civîna Komîteya Navendî tevî pejirandina terhê (piroje, gellale) pêşniyarkirî, vî terhî (gellaleyî, pirojeyî) dişîne kongireya 16.mîn ya PDKÎ, da ku bi pejirandina vî terhî ji aliyê kongireyê ve, PDKÎ qonaxeke din ya xebat û tekoşînê li ser bingeha baweriya bi demokrasî, û têgihîştina ji guhertinên di nava civakê de, û hewcehiyên serdem, û kar û biryara bikom û hevpar, bidomîne.

PDKÎ
Deftera Siyasî

29.10.1396
19.01.2018

»»»» Doma Manşêtê

kuştin, ne di nava girtîgehê de.
Ew şêwaza serederiya rejîmê digel neraziyan bûye sedema bilindbûna dengê rêkxirawên parêzerê mafê mirovan, û di vê çarçoveyê de Rêkxirawa Berevanî ji Mafê Mirovan a Kurdistanê daxwaza bersivdana derheq canjidestdana hevwelatiyên girtî , ji berpirsên dewletî emniyetî û dadwerî kir.
Rêkxirawa Berevanî ji Mafê Mirovan a Kurdistanê di daxuyaniyekê de ragehand ku îdi`aya berpirsyaran di vê derheqê de cihê gumanê ne, û dibe ku lêkolîn li ser vê pirsê bê kirin.

Di beşeke vê daxuyaniyê de hatiye: Her bi vê şêweyê ku medyayên navxweyî û derveyî rûmal kirine, hewlên emniyetî û polîsî ên Komara Îslamiya Îranê bona kontrolkirina nerazîbûnên xelkê, yan bi gotineke din serkutkirina meşên medenî li raserî Îranê de, heya niha bûye sedema canjidetsdana dehan hemwelatiyên medenî, û destbiserkirina hezaran hevwelatiyên din.
Rewşa îşarepêkirî, meclisa rejîmê jî anî deng, û meclisê hişdarî da dewletê ku hekî em lezê lê nekin, û çareseriyeke lojîkane nebînin ji bo daxwaziyên xelkê, ne zelal e, ku çi bê serê me.
Ew lahîkirinên hinek ji endamên meclisa rejîmê di demekê de ye ku Wezareta Îtila`atê û dezgehên din ên serkutkar berdewam in li ser cinayetan, û roj nine ku di yek ji girtîgehan de, termê hevwelatiyekî îşkencekirî nehînin derve.
Di vê demê de em dibînin ku serkomarê bi nav reformxwaz ê rejîmê jî di cihê hewldan bo çareseriya kêşeyên bingehîn ên xelkê, û cebirandina birînên xelkê, ragehandiye: Her welatek mijûlî şerê derveyî sînorên xwe be, nikare bîr ji vegeşîna navxweyî bike, ku her wekî çalakên siyasî dibêjin, mebesta navbirî ew e ku em nikarin hem li derveyî sînoran hewla qahîmkirina pêgeha xwe bidin, û hem jî ji aliyekî din ve xelkê Îranê razî bikin!.

Ya ku zelal e, ew e ku di demekê de ku vegeşîna navxweyî di ew qasê lawaziya xwe de ye, û xelk neçar e ku birêje ser kolanan, û daxwaza mafê xwe bike, lê rejîm berdewam e li ser destêwerdanên xwe di nava karûbarên welatên herêmê de, û heya bûye sedema kuştina bi hezaran hevwelatiyên sivîl û medenî di welatên wekî Îraq û Sûriye û Yemenê, ku ew yek jî tenê di çarçoveya dukturîna “şandina derve ya şoreşê” ya Xumêynî ye.
Li ser bingeha van cinayetan e, ku em dikarin bêjin cinayetên bi vî rengî di nava reşçalan de ji aliyê rejîmê ve, tenê û tenê pêkutana berî mirinê ya rejîmê ye bona xwederbazkirina ji van kirîz û kêşeyan.

Nerîna Lîderan



Trump: “Niha li Îranê dema guhertinê ye”!



Tîlirson: “Emê bo pênc armancan li Sûriyê bimînin”.



Salih Muslim:
“Efrîn jî wekî Kobanê amade ye bo berxwedanê”.



El-cobeyr: “Rejîma Îranê metirsiya herî mezin e li ser herêmê. Bercam dibe ku were sererastkirin”.

Serkomarê Amerîkayê: Eva cara dawiyê dibe ku helavîstina tehrîman berdewam dibe



Piştî vê ku Trump ragehand bo cara dawiyê ye ku ew helavîstina tehrîman li dijî rejîma Îranê dubare dike, kongireya vî welatî jî piştgiriya vê biryara Trump kir.

Yek ji endamên kongireya Amerîkayê bi navê “Bob Corker” senator Komarîxwaz û serokê Komîteya Pêwendiyên Derve ên Senayê di twittekê de nivîsand:
Ez fikir dikim ku hemû Amerîkayî armanca wan ya hevbeş ragirtina rejîma Îranê be, bona vê ku nekare çeka etomî bi dest bixe.

Wî herwisa got ku li ser daxwaza serkomar min digel tîma ewlehiya neteweyî ya Koşka Spî û hinek ji hevkaran di Senayê de ku ji herdu hizban pêk hatibû alîkarî kir, da ku em bikarin riyekê bona nehêştina şaşiyan peyda bikin, bêy vê ku em pêbendiya Amerîkayê bi rêkkevtina navikî binpê bikin.

Serokê Nomîteya Karûbarê Derve ya Kongireya Amerîkayê “Id Royse” jî ji partiya Komarîxwaz di Fox Tv de tevî berevanîkirina ji kiryara Trump got: Dewleta berê ya Amerîkayê ne tenê li hemberî gef û metirsiyên rejîma Îranê de nesekinî, belkû perê next (kash) jî da wan.

Wî got: Em şahid bûn ku xelkê Îranê di meşên nerazîbûnê de digotin ku rejîm vî pereyî nade me, dide girûpên terorîstî di Sûriyê de, û dide Hizbullahê.

“Ilyot Engel” endamê payebilind ê Komîteya Karê Derve ya kongireya Amerîkayê ji Hizba Demokrat a Amerîkayê di daxuyaniyekê de ragehand: Rejîma Îranê gef e, hem bo herêmê û hem jî bo xelkê xwe, û tu carî nabe ku çeka mavikî bi dest bixe, û got: Berdewamiya li ser ragirtina tehrîmên Îranê, biryareke dirust e.

“Ted Cruz” senator Komarîxwaz jî di daxuyaniyekê de nivîsand: Biryara Trump di vê derheqê de ku cardin êdî amade nabe, berdewam be li ser ragirtina tehrîman, biryareke baş û di ciyê xwe de bû.

Wî got: Rêkkevtina navikî ya Obama digel rejîma Îranê karesat bû, ne tenê nabe sedema pêşîgirtina ji rejîmê bona destpêregihîştina wê bi çeka navikî û teknîka mûşekî, belkû pere (dirav) jî kire para wan.

Lewra Komarîxwaz nabe tu carî îznê bidin ku rejîma Îranê bi diruşma mirin bo Amerîkayê û metrisiya li ser canê bi milyonan Amerîkayiyan bigihîje çeka etomî.

Wî got riya baş ew e ku dawî bi rêkkevtina Obama digel rejîma Îranê bihêt, û niha kongireyê derfeta vê heye.

Di beşeke din ya daxuyaniya navbirî de hatiye: Îro rojê bi milyonan kesî li dijî hikûmeta wehşî û serkutkar ya rejîma Îranê ne. Xelkê Amerîkayê dige we ne. Em jî li dijî rejîma hov ya axûndan in, û di vê riyê de, bona gihîştina bi azadiyê, emê pişta we bigrin.
“Marco Rubio” senator Komarîxwaz ê Filorîdayê jî di twittekê de nivîsan: Em nikarin îznê bidin ku rêkkevtina binpêkar ya Obama emraza herî bihêz ya tehrîmê rake, ku rakirina van tehrîman dibe sedema binpêkirina zêdetir ya mafê mirovan, berfirehkirina pirogramam mûşekî û piştgiriya ji terorîzmê ji aliyê rejîma Îranê ve.

“Leonard Lance” endamê Komarîxwa ê Kongiresê ji herêma “New Jersey” li ser biryara Trump nivîsand: Siyaseta min ya pêş hemiyan ew e ku ez ji xelkê Îranê bergiriyê bikim, rêkkevtina lawaz sererast bikim, destdirêjîkaran û terorîstan û piştevanên wan ceza bikim. Dibe hevalbendên Amerîkayê jî alîkar bin, û çalakiyên şerxwazane yên rejîma Îranê metirsî li ser hemû cîhanê heye.

Zerîf Wezîrê Karê Derve ê rejîma Îranê jî piştî vê biryarê ragehand: Em bo tu awayî gotûbêjan li ser vî rêkkevtinê nakin.

Hêjayî basê ye ku Hinek ji rayedarên Amerîkayî ser vê baweriyê ne ku hekî Amerîka ji vê rêkkevtinê derkeve, welatên Ewropayî amade nabin hevkariya Amerîkayê bikin bona zext û givşxistina li ser rejîma Îranê bona berçavgirtina mafê xelkê nerazî.

Herçend di rastî de heya niha jî, ji bilî weşandian daxuyaniyên nerm, me di piraktîkê de çi helwesteke micid ji Ewropiyan nedîtiye, ku bibe sedema desthilgirtina rejîma Îranê ji serkuta neraziyan.

A: Şehab Xalidî

www.rasiyakurd.org

Rejîmê vê carê bi fîlma “Koysenciq” hewla çewtekariya da

A: Şehab Xalidî

Rejîma Îranê di doma şerê re-wanî û şerê ragehandinî li dijî PDKÎ, vê carê fîlmek li jêr navê “Koysenciq” belav kir, û tê de çend pasdar û bikuj bi derevan hewla berevajînîşandana rastiyan didin. Herçend bêguman ew bi belavkirina vê fîlmê dixwazin gellek armancên xwe yên qirêj bipêkin, ku yek ji wan eşkerekirina wan kes û aliyên Kurdî ye ku bi wan re alîkar bûne.

Yek ji beşdarên vê fîlmê Sehrarûdî bikujê şehîd Dr. Qasimlo ye, ku bas ji çawaniya beşdariya xwe di êrîşa li ser binkeyên PDKÎ di Koyê de dike.

Armanceke din yan wan ew e ku wisa nîşan bidin wan bi vê êrîşê karî bi yekcarî xebata PDKÎ bidin sekinan-din. Di demekê de ku xebata çekdarî qet ji aliyê PDKÎ ve nehatiye retkirin, belkû bo heyamekê bo berçavgirtina berjewendiya Herêma Kurdistanê hate ragirtin, lê ew xebat bi şêweyên curbicur berdewam bûye, û tîmên pêşmergeyan jî berdewam di navçeyê de bûne, û di çarçoveya parastina rewa de tekoşîn kirine. Mînaka herî berçav jî destpêkirina xebata nû ya PDKÎ li jêr navê Rasan de ye, ku vê xebatê ew qas rejîm xiste tengaviyê, ku gefa bombebaran û têkbirina Hew-lêrê xwarin.

Di beşeke din de, bi derev bas ji vê dikin ku bo me girîng nebû PDKÎ çiqas “telefat” (kuştî û birîndar) hebin, belkû girîng ew bû ku êdî em wan neçar bikin, ku cardin ji sînorên me re derbaz nebin. Lê Di vir de çend derevên wan pasadran eşkere û xûya ne.

1-Ew ji aliyekî ve navê Hizba Demokrat wekî hizba “Munhele” (hilweşiyayî) tînin, lê ji aliyekî din ve îtiraf dikin, ku pêşmerge bihêz bûn, û dihatin, û her carê emeliyat (operasi-yon) eke mezin encam didan, û gellek pasdarî dikuştin. Herwisa pirsyar li wan pasdaran ew e ku gelo hekî ew hizba Munhel bûye, çima we hey-amek e gellekçalakne dest bi çêkirina fîlman li ser vê hizbê kiriye?!.

2-Ew di demekê de bas ji girîng-nebûna bi gotina xwe telefatên PDKÎ dikin, ku di rastî de wan heta amadekarî kiribûn bona vê ku piştî têkşikandina PDKÎ rêbertiya PDKÎ jî bi tewahî bixin nava wan qefesan de, ku digel xwe anîbûn.

3-Dereveke din ew e ku her piştî vê êrîşê, roj-nameya “Îran” di hejmara xwe ya roja Sêşemiyê 9`ê Gelawêjê daxuyaniyeke Spaha Pasdaran belav kir, û ragehand ku wan kariye 20 kes ji endamên herî bibandor di rêbertiya PDKÎ de bikujin, û %60 ji binkeya Deftera Siyasî û organên derdorê biherifînin. Lê li ber vê ku dereva wan eşkere nebe, îşare bi çi navekê nekiribûn.



Rojnameya “Îran” wê demê nivîsan-idibû ku, wan kariye 20 kes ji endamên herî bibandor di rêbertiya PDKÎ de bikujin, û %60 ji binkeya Deftera Siyasî û organên derdorê bi-herifînin. Lê li ber vê ku dereva wan eşkere nebe, îşare bi çi navekê nekiri-bû.

4-Dereveke din ya wan ew bû ku digotin me soz dabû aliyên berpirsyar di Herêma Kurdistanê de, ku zirar negihîje tu kesekî medenî. Lê 3 kes ji xelkê medenî birîndar bûn, ku yek ji wan zarokekî 6 salî bû, û piştre yek ji birîdaran ku jin bû, jiyana xwe ji dest da.

5-Pirseke din ya girîng ew e ku ew hemû hêza ku anîbûne ser binkeyên hizbê, tenê fermandeyên payebilind nebin, piraniya wan li gorî zaniyari-yan nedizanîn ku bi çi armancekê têne nava xaka Herêma Kurdistanê de, û bi hêceta manoreke berfireh ew xapandibûn.

6-Di fîlmê de yek ji pasadaran bas ji tirs û lerza çekdarên xwe dike, dema ku di geliyekî de trafîk saz dibe, û ew lê asê dimînin, ew yek bi başî nîşan dide ku beşeke çekdarên wan bi zorî yan bi xapandin anîbûne ser binkeyên hizbê, lewra jî her bîstekê li benda vê bûn ku rastî bersivdana tund ya pêşmergeyan werin, û di rastî de hekî li ber rewşa Herêma Kurdistanê jî neba, wê derbeke wisa biwariban ku riya vegerê winda kiriban.

Di dawiyê de em dikarin bêjin,di demekê de rejîma Îranê û ragehandina wan bi derev de dibêjin, ku ew êrîş bû sedem ku PDKÎ nekare çalakiyan bike û aramî vegere navçê, ku tenê çend rojan piştî vê êrîşa rejîmê bo ser binkeyên PDDKÎ, Desteya Koman-doya Urmiye û ya Kêleşînê bi hev re li Nerzîwê derbeke gellek giran li rejîmê xistin, û 130 kes ji hêzên rejîmê kuştin û, bi vî awayî derseke jibîrnekirî dane pasdar Kazimî û kirê-girtiyên wî, û Erbabên wî li Tehranê. Ji wê demê şûnda heya niha berde-wam PDKÎ di navçeyê de bi şêweyên curbicur amadeyî hebûye, û tu carî nehêlaye ku Kurdistan ji bo dagîr-keran herêmeke êmin be, berevajî armanca hizba Demokrat vegerandina aramiyê bo xelkê Kurdistanê bûye, berevajiyê wan çewtekarî û derevên wan fermandeyên rejîmê ku xwe dikin wekîlê xelkekî, û bas ji vege-randina aramiyê bo xelkekî dikin, ku wî xelkî tu carî hebûna wan qebûl nekiriye, û wan dagîrker û sebebkarê hemû nearamiyan û hemû kêşeyan di Kurdistanê de dizanin.



Ew bixwe jî baş dizanin ku wan derevên wan, ne tenê di Kurdistanê de, belkû heta di nava sertaserî Îranê de kiryar çinin, û Hizba Demokrat reh û rîşeyeke wisa qahîn di nava xelkê xwe de heye, ku bi çi hêzekê ew nikarin xelkê Kurdistan û PDKÎ ji hev cuda bikin.

www.ersivakurd.org

Reportera taybet a mafê mirovan: Hikûmeta Îranê neçar e ku bersiva xelkê bide



Reportera taybet a mafê mirovan a NY ragehand ku rewş nikare bi vî rengî berdewam bike, û rejîma Îranê neçar e ku di dawiyê de digel xelkê xwe li hev bike.

Asime Cehangîr di hevpeyvîna xwe ya bi BBC re ragehand ku: "Min berê jî gellek caran di raporên xwe de bas kiriye, ku gellek îşkencegeh di girtîgehên rejîma Îranê de hene. Herwisa gellek xwendekar niha hatine girtin. Em vê yekê bi tundî mehkûm dikin.

Ew yek li dijî pirensîpên navneteweyî ye, ku kesekî seba baskirina ji hêvî û daxwaziyên xwe bixî nava girtîgehê de".

Asime Cehangîr reportera taybet a mafê mirovan herwisa dibêje: "Bi baweriya min rewş di Îranê de bi dilê rejîmê nabe, tenê wê demê nebe ku rejîm bersiva xelkê bide,û mafê wan bide. Niha rewşeke pirr metirsîdar di Îranê de heye, û xelk tê serkutkirin, tu hikûmetek nikare xelkê xwe biçewsîne, û heta dawiyê jî li ser kar bimîne".

Navbirî di demekê de vê hevpeyvînê dike, ku nîgeraniyeke gellek zêde derheq rewşa girtiyan heye.

Nûnerekî meclisa rejîmê jî ragehandiye ku heya niha nêzî 3700 kesî hatine destbiserkirin.

Di van meşên ku ji roja 7`ê Befranbarê ve di Meşhedê de, bi diruşmên tund li dijî rejîmê dest pê kirin, û bilez gihîşte dehan bajarên din ên Îranê jî, zêdetir ji 25 kesan heya niha jiyana xwe ji dest dane.

Meclisa rejîmê jî nikare hejmara kuştiyan veşêre



Endameke meclisa rejîmê radigehîne ku her rojê naveke nû yê kuştiyên meşên nerazîbûnê di girtîgehan de eşkere dibe, û ew yek wan nîgeran dike.

Perwanê Selehşûr endama meclisa rejîmê tevî ragehandina vê ku hejmara kuştiyan di girtîgehan de her roj zêdetir dibe, û ew yek cihê nîgeraniyê ye, ragehand jî, ku Saziya Girtîgehan berpirsyar e di hemberî canê girtiyan de, û diber bersivder be.

Wê ragehand ku ew dixwazin serdana girtîgehan bikin, û girtî çi siyasî bin yan ne siyasî, Saziya Girtîgehan berpirsyar e di hemberî parastina canê wan de.

Perwanê Selehşûr di bersiva vê pirsê de ku gelo wan serjimêriyeke rast ya hejmara kuştiyan di ber dest de heye yan na, got: Mixabin em nizanin hejmara rast ya wan çend e, lê em dixwazin ser dosiyeya wan kar bikin, ji Sîna Qenberî ve bigre heya Saro Qehremanî, da ku sedema mirina wan zelal be.

Serbarê vê ku Mehmûd Sadiqî serokê feraksiyona "Şefafsazî" (zelalkirinê) a meclisa rejîmê ragehandiye ku 40 kes ji nûnerên Dezgeha Dadweriyê nameyek ji serokê meclisê re şandine, û daxwaz kirine ku girûpeke serbixwe pêk bê, da ku lêkolînê li ser sedema mirina girtiyan bike, lê Elî Muteherî cihgirê serokê meclisê, û Mihemed Kazimî cihgirê serokê Komîsyona Dadwerî ya Meclisê, ragehandin ku daxwaza wan di vê derheqê de bê encam maye.

Diyardeya kezîfiroşiyê jî derket



Li ber rewşa xirap ya aborî, hinek ji keçên pirçdirê keziyên xwe difiroşin.

Li gora nûçegihaniya Mêhr, Dr. Mecîd Ebherî xisarnasê civakî di vê derheqê de dibêje ku hinek ji keç û jinên pirçdirêj bona bidestveanîna dahatekê bo jiyana xwe, pirça xwe bi 100 hezar heya pênc milyon Tûmenî difiroşin.

Ew xisarnasê civakî dibêje: Ew keç û jin diçin dukanên şeqama Menûçêhrî ya Tehranê ku di nava pasajên curbicur de ne, û li wir karnas nirxekê li ser pirç û keziyên wan dadinên, ku hekî pirç dirêj be, reng nexwaribe, û kevnik (şûre, tojk) tunebe, û qalin û tejî be, nirxa wê zêdetir e.

Gellek ji wan keç û jinan, pirç û keziyên xwe ji bo kirîna cilûberg, kîf, û solikan difiroşin, û hinek ên din jî bona kirîna dewa û dermanan ji xwe û malbata xwe re difiroşin.

Kesên kiryarê wan pirç û keziyan jî, temenê wan di navbera 25-60 saliyê de ye, û piraniya wan jî ji çîna dewlemend in.

Dr. Mecîd Ebherî xisarnasê civakî di dawiyê de bas ji vê dike, ku herçend ew hereket gelelkî şerafetmendane ye, û bona ku riyên din bona bidestveanîna dahatê ji xwe re hilnebijêrin, rû li vî karî dikin, lê eva rastiyek e ku keç û jin gellekî girêdayî pirça xwe ne, û firotina pirçê, wê encamên gellek xirap ên derûnî bo wan hebin, lewra dibe ku aliyên pêwendîdar, ne tenê bi diruşm belkû bi kiryar hewlê bidin bona nehêştina hejarî û destengiyê di welatê me de.

www.arsivakurd.org

Şerê jinên êzidî yên kurd li dijî DAIŞê bû fîlm

Yekem wêneyê fîlma "Eva Husson" bi navê Girls of the Sun (Keçên Rojê) a derbarê şerê jinên êzidî yên Kurd li dijî DAIŞê de hat belavkirin.





Di fîlma derhênera Fransî **"Eva Husson"** de, **"**Golshifteh Farahani**"** û **"**Emmanuelle Bercot**"** di fîlmê de rol wergirtine û behsa çîroka şervanên Kurd ên ku li dijî DAIŞê şer dikin dike.

Aktirîsta îranê **"**Golshifteh Farahani**"** di fîlmê de rola fermandeyeke jin bi navê "Buhar" dilîze. "Emmanuelle Bercot" jî bi navê "Mathilde" di rola rojnamegerekê de ye.

Biryar e fîlm di festîvalên girîng ên sala 2018an de ji bo cara pêşî bê nîşandan. "Eva Husson" piştî ku pê hesiya ku jinên Kurd xwe ji dest DAIŞê rizagar kirine, biryara çêkirina vê fîlmê daye.

"Golshifteh Farahani" li ser hesabê xwe yê "Twitter"ê wêneyeke fîlmê parve kiriye ku tê de bixwe wek şervaneke Kurd diyar dibe, û li ser wêneyê jî nivasindiye "Keçên Rojê".

Nivîsîn: Aydin Bayram

www.arsivakurd.org

Helbestvanê Kurd Xelîl Sasonî hate bibîranîn

Li holeke nav bajarê Qamişlo ya Rojavayê Kurdistanê, bi maresîmekî taybet helbestvanê Kurd yê koçkirî Xelîl Sasonî hate bîranîn. Keça Sasonî dibêje, daxwaza bavê wê ew bû ku bi zimanê Kurdî bê nivîsandin û xwendin û folkolora Kurdî bê parastin.

Ji gelek bajarên Rojavayê Kurdistanê rewşenbîr û nivîskarên li bajarê Qamişlo ji bo bîranîna helbestvan Xelîl Sasonî merasîmek saz kirin.

Di bîranînê de belgefilma jiyan û berhmên Xelîl Sasonî hat nîşandan. Di belgefîlmê de hate bibîrxistin, ku wî gelek dîwanên çapkirî û yên neçapkirî li pey xwe hiştine, Sasonî bi helbestên xwe bersiv daye nexweşiyê. Helbestvan û parêzerê Kurd Xelîl Mihemed Elî Yûnis, an ku Xelîl Sasonî, ku di jiyana xwe de bi nivîs û helbestên xwe dijatiya sînoran dikir, bi mirina xwe jî sînor derbas kirin.

Ew di sala 1944ê de li Qamişlo ji dayik bibû û roja 3ê Kanûna 2017ê, di 73 saliya xwe de, ji ber nexweşiyeke giran, li Êliha Bakurê Kurdistanê jiyana xwe jidest da.

Xelîl Sasonî ji ber nexweşiya penceşêrê ku dora 7 salan bû pê ketibû, wefat kir. Ew li gundê bav û kalên xwe yê bi navê Gundê Nû ya Êlihê, li kêleka gorên kesûkarên xwe hat veşartin.

Helbestvanê Kurd Xelîl Sasonî yek ji stûnên helbesta klasîk û kêşsaz a kurdî li Rojavayê Kurdistanê bû û yek ji dostê herî nêzîk ê helbestvanê mezin Seydayê Cegerxwîn bû.

Sasonî di jiyana xwe de gelek dîwanên helbestan weşandin û hê jî çend berhemên wî nehatine weşandin. Ristên Sasonî bi evîndarî û eşqa Kurdistanê tije bûn û gelek ji helbestên wî yên neteweyî bûne stran û li sar zar û zimanan geriyan.



Di sala 2009an de Xelîl Sasonî Xelata Cegerxwîn a Afirandina Helbestê wergirt, herwiha di sala 2016an de xelata Helbetsvanê Nemir Ehmedê Palo ya Helbestê wergirt.

Lêkolînvanê Kurd Îbrahîm Mehmûd li ser koçkirina Xelîl Sasonî wiha dibêje: "Ez nizanim niha helbestvanê me Sasonî li ku ye, yan jî erdnîgariya gewdeyê wî û seqaya canê wî ya hundirîn çawa ye! Gelo ew li ser kîjan tixûbên jiyanê tevdigere, dilê wî bi kîjan jiyanê lêdide û laşê wî dilerize. Xelîl Mihemed Elî Sasonî, bi wê êşa ku te li jiyanê dihêle bijî. Gelo ewê vê êşa min bi rabûneke din a giyan bixwîne?"

Nivîs: Necmî Salih

Zimanê Kurdî

Qursên Kurdî, A. Karabax

Qursên Kurdî, A. Karabax

6

Îsal(î + sal) ☐ Îsal zarokên me dest bi xwendinê kirin.

Îcar(î + car) ☐ Karên wan îcar ne giran in.

Mînak 523/3 : Bi qertafa neyîniyê : Na/ne/ni : Çend bikaranîn :

a. Dibe nabe ez ê bêm salona konferansê.

b. Na, ew nikara beşdarî konferansê bibe.

c. Tu dikarî nikarî, ew kesên biyanî pê dizanin.

Ji helbestan : .../Ne bi gilî me/Ne demdemî me/.../A. Karabax

D) Ji aliyê hevoksaziyê ve hoker :

Ev peyv, di hevokan de ne wek hêmanên bingehîn in lê bo wan alîkar in; giraniya alîkariyên van, xwe bi bandorî didin ser çalakiyên lêkeran.

Mînak 524 : Di hevokan de hoker : Çend bikaranîn :

1. Di qedînekan de : Piraniya wan bi wateya navdêrîn bikar tên :

a/1. Dotira rojê, li Berîvanê bûye reşbînî. a/2. Li Berîvanê çi bûye reşbînî?

b/1. Duh danê sibehê hîn germ bû. b/2. Duh kengî hîn germ bû?

2. Di avaniya dançêkir de :

a/1. Dar di tebaxê de dan birîn. a/2. Dar di tebaxê de dan birîn?

b/1. Payîzê xaniyek dan avakirin. b/2. Xaniyek payîzê nedan avakirin.

3. Di peyvên çêbiwar de : Wek rengdêr û navdêran bikar tên :

a/1. Saet ji şeşan re çaryek hebû, mirovê zûhatî diçû sûka kevnefiroşan.

a/2. Saet ji şeşan re çaryek hebû, yê zûhatî diçû sûka kevnefiroşan.

b/1. Saet ji nehan re pênc hene, kesên nexwendî li benda kê ne?

b/2. Saet ji nehan re pênc hene, yên nexwendî li benda kê ne?

4. Di erkên kirdeyî de : Piraniya wan bi wateya navdêrîn bikar tên :

a. Şeva dereng diboriya xemgîniyek dida ser dilêşa min.

b/1. Hatin nehatin bi meşan pêk tên. b/2. Hatin nahatin bona çi dibin?

5. Di hevokan de dibin têrker :

a/1. Em danê êvarê diçin dîlanê. a/2. Danê êvarê em diçin dîlanê.

b/1. Wan, masî teze teze biraştin. b/2. Masî teze teze hatin biraştin.

6. Di erkên pêveberî de :

a/1. Azad ji Memê leztir e. a/2. Wan şîr bi germî vexwarin.

b/1. Ew piştî nîvro diçûn dibistanê. b/2. Ew ji nîvro şûn de diçûn dibistanê.

Tiştonek



A: Mahir Berwarî

- Sê selik di ber avê da dihên. Ek tû tê, êk gû tê, êk mû tê. Bi devî cûm ya tû tê, bi destî cûm ya mû tê, bi pî cûm ya gû tê.

- Cêrkê rûnî li bin riha rûlê, kîşk rûlê? ew rûla rex ala rê.

- Şê seyê Şeru hene, her sê seyên Şeru şerrkirin, şer ji şerrê seyên Şeru xweştir nebû.

- Ew reşmal e şeş text e reşmal e, terr şeş text e reşmal e.

- Pîrejiney gu zerd, gu zerd im be demit, demit be gu zerd im.

- Cencerî hem e, xencerî cîre cîryetî.

- Çil çeng tu çeltuk, çuwe kin çil çeng tu çeltuk, gutî:
Eto çi çil çeng çeltukî? Gutî:
Emin çil çeng tu çeltuk im,
edî tu çi çil çeng tu çeltukî?

Têdîtin: Amadekar destkariya devoka metelokan nekiriye

Xwendevanên hêja!
Hûn dikarin bersiva tiştonekan bi riya E-Maila Agiri2003@gmal.com ji me re bişînin

www.arsivakurd.org

Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (318)

Pêşewayê Kurd Qazî Mihemed rêberek ku tu carî namire


Weney Komari Kurdistan (Courtesy Photo)

